# NÎLÛPER(LÎLÛPER)

**Navê wê**:
Gula Nîlûperê ku dûre di nivîsên Erebî de ji ber nebûna dengê “P”yê weku “Nîlûfer”ê hatiye nivîsandin, ew weku gula “Sewsena Rojhilatî” û “Helaleya nava avê” û “Lûtûs”ê jî nasnav e.



**Gula Nîlûperê di bîrûbaweriyên Kurdî anku Mîtrayî(Zerdeştî, Yarsanî û Êzîdî)yê de**:
Gula Nîlûperê di çanda û baweriya Kurdî de hêmaya mêhr, ronahî û tav anku Mîtra ye + avê, heta di efsaneyê de tê gotin ku Mêhr yan Mêhra yan jî Mîtra di şeva Mêhrê(Yelda)yê de Mîtra ji gula Nîlûperê derket û hate dunayê. Di baweriya Mîtrayî de Nîlûper hevtuxma Tav û Avê ye, ew di nava avê de şîn dibe lê herdem berê wê li tavê ye û bi hilhatina tavê re serê xwe vedibe û bi avabûna tavê re serê xwe digire. Di çax û dema Mediyan de gula Nîlûperê hêmaya Mîtra û yezdanê bûye ta dema Sasaniyan jî ku hêmaya Mêhr-Mîtra, Anahîta û Ahûrayê bûye. Weku

me amaje da Nîlûper di dînên Kurdî de pîroz e bi taybet di dînê Mîtrayî de ku santral û koka hemû dînên Kurdî ye ku yek ji wan dînê Zerdeştiyê ye û di Zerdeştiyê de hêmaya Ahûra mezdayê ye û di nexşên hilkolandî de nexşandine ku Gula Nîlûperê di destê Ahûra mezda de ye û li ba Zerdeştyan ta niha jî pîroz e.






**Di warê arkolojiyê de**:
Li ser gelek kevirenivîsên arkolojî yên Kurdistanê, nîgarên gula Nîlûperê hatine nexşandin û hene bi taybet li herêma Loristanê û bajarê Kirmaşanê li derên “Şûş”ê û “Taqwosan”ê û “Texta Cemşîd”ê.. Nexşa vê gulê weku hêmaya dînê Mîtrayê li ser Taqwosanê li rojhilata Kurdistanê hatiye hilkendin. Li Kirmanşanê kaniyek heye bi navê “Kaniya serava Nîlûperê” ku gula Nîlûperê têde geşe kirine û niha bûye sembola fermî ya bajarê Kirmaşanê. Li Laleşê û Mêhrabên wê anku şekftên wê, wêneyên Gula Nîlûperê hene ku heman pîroziyên Mîtrayî ye. Her weha li ser piranî arkolojî û hilkolên Medayayiyê de heta dema Sasaniyan jî, nexşên şahan bi şikileke ku gula Nîlûperê girtine dest weku hêmaya aştî, biratî û hevjiyaniyê. Lewma jî gula Nîlûperê weku nîşana mêrevanî, dilovanî û aştiyê ye di nava Kurd de bi taybet di çaxên kevin de.

**Nîlûper di warê çandê de**:
Di nava civakê de bernas e ku eger di xewn de kesek gula nîlûperê bibîne sûd û fayede ye û hildana wê jî nîşana xemê ye. Her weha di nav Kurdan de gula Nîlûper û Jinsalarî yan jî dayiksalarî ya Mêhrî-Mîtrayî bi gula Nîlûperê tê pênase kirin û pelên wê û rengê wê weku hêmaya jinê hatiye dîtin.

**Gula Nîlûperê di derên din de jî**:
Li welatê Misirê jî gula Nîlûperê tê dîtin û di kevin de rêz li Nîlûperê girtine û li der û dîwarên kolandî yên nîgarkirî di destê şah û keyan de tê dîtin. Her weha di hûnerên Yunanî û Romiyan de gula Nîlûperê hêmaya vejîn bûye anku mirin û zadbûna nû û hêza ronahiya xwezayê bûye ku ez guman dikim her heman fikir û baweriya Kurdî ya Mêhrî-Mîtrayî bûye û gihitiye wir jî. Di dînê Budayiyê de jî gelek caran nîgara Buda li ser gula Nîlûperê hatiye nexşandin ku Nîlûper belên xwe vekiriye û Buda jî li ser pelên Nîlûperê rûniştiye lew bûye hêmaya cawîdanî û nemiriyê.

Lêkolîn û nivîsîn: **Qendîl Şeyxbizînî**